


**Sala we ya nû û newroza we pîroz be. Sala borî salek tejî ji êş û azar û bê parî ji bo tewaya xelkê Îranê û bi taybetî neteweyên zulmlêkirî û yek ji wan neteweya Kurd bû...**

Birêz Mistefa Hicrî

•••» 2




Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de


# AGIRÎ

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (202) 20-03-2013 Buha (150) Tûmen


### Newroza 2013'an pîroz be

Adar! Heyva serhildanên mezin, berxwedanên bi heybet, dema geşbûna çirûskên roniyê, bizdiyana tarîtiyê, xurtbûna hez û îradeya gel bo azadiyê, destpêka vejîna jînê û vegeşîna hêviyên serkevtinê li welatê Newrozê. Adar! Heyva birîna Helebçê, destpêka rûreşiya herî mezin a dîroka dagîrkerî li Kurdistanê, êrîşên bednave Enfalan, bizmarên li dora sindirukên Qaziyan, dojehbarana li Sine, qêrîna Amedê, hejîna Cizîrê, hawara Qamîşloka têhniyê kelecana azadiyê.

**Hîwa Mîrzayî**



kuştara bi kom li gundên Nexedê

•••» 4

**Dara Natiq**

PDKÎ û avakirina kongireya neteweyên Îrana federal

•••» 5


**Selîm Zencîrî**



Pêngavek giring

•••» 7

**Îlham Çayçî**



24'ê Reşemê destpêkek nû...

•••» 9

**Ebdulla Hicab**



Adar bi agirê newrozê xweş e

•••» 10

# Newroz berxwedan û Serhildan e



Gelê Kurd li raserî cîhanê de, rêûresma newroza evsal bi coşek mezin ve pîroz kirin. Her bi vê boneyê roja 20'ê Adarê rêûresmek bi coş li binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ de birêve çû. Di vê rê û resmê de birêz Hesen Şerefî cîgirê sekreterê giştî ê PDKÎ tevî bixêrhatinkirina mêhvanan û rêzgirtina ji berxwedana girtiyên siyasî ên Kurd li girtîgehên rejîma Îranê de, li ser hewcehiya piştevanî ji wan girtiyan, û daxwaza azadiya wan xortên gel, ên di girtîgehên rejîmê de pêdagirî kir.

Cîgirê sekreterê giştî ê PDKÎ herweha cejn û kêfxweşî wek taybetmendiyên newrozê hesiband ku ew yek dijî naweroka reş û biyûm a Komara Îslamiya Îranê, û şêweyek ji xebatê ye. Di beşek din ji vê rêûresmê de peyama hevbeş ya PDKÎ û Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê hate xwendin, ku deqê vê peyamê li rûpela 3'ê de hatiye bilavkirin.

Di beşek din ya vê rê û resmê de ku li derveyî cihê rêûresmê birêve çû, agirê newrozê ji aliyê rêzdaran Hesen Şerefî cîgirê sekreterê giştî ê PDKÎ, Faroq Babamîrî endamê Deftera Siyasî a Komelê, û Mesûd Tek sekreterê giştî ê Partiya Sosyalîst a Kurdistana Turkiyê ve hate hilkirin. Ew rê û resm di nav govend û dîlana bi xeml a Kurdî de bidawî hat.

www.arsivakurd.org

# Kurd û sala borî

Şehab Xalidî

sergotar

Newroza îsal di demekê de dest pêkir ku xelkê welatê me li jêr zulm û zoriya deshilatdarên Îranê de, ne tenê rizgar nebûne, belkû rojên herî bi êş derbas dikin. Girtina xelkê bê sûç bi tawana karê siyasî, girtin, û heta kuştina kolberên Kurd bi awayên herî hovane, îdama bê navber, û serbarê wan hemî cînayetan, giranî û bêkariya bê qas jiyan ji xelkê welatê me reş û tal kiriye.

Li bakûrê Kurdistanê de jî herçend ku sala borî şer û pevçûn li navbera tevgera gelê Kurd û hêzên leşkerî ên Turkiyê de berdewam bû, lê bi xweşî ve niha pêvajoyek dest pêkiriye ku navê pêvajoya çareseriyê bi xwe ve girtiye.

Herçend em nizanin gelo ew pêvajo bi ratsî wê bikare deriyê çareseriyê veke, yan na, lê em hêvî dikin ku deshelat jî weke Kurdan niyetpakiya xwe biselimîne û dilê çareseriyê û dawîanîna bi rijiyana xwîna xortên Kurd û Turk bîne.

Li Kurdistana Sûriyê de jî Kurd tewaya hewla xwe didin ku ji vê rewşa heyî, baştirîn û zêdetirîn deskevtan bi dest bixin. Herçend hewce ye ku ew nav mala xwe hêla jî serûber bikin û yekîtiyek bihêz pêk bînin bona ku bikarin bigîjin wan armancên xwe.

Bi hêviay vê ku gelê Kurd li sala 2013'an de, agirê xebata xwe li her yek ji wan beşên Kurdistanê de, bi têhn û gurrtir bike, û bikare bi berxwedan û tekoşîneke birûmet bigîje wan armancên xwe yên rewa, ku di pêxema wan armancan de nirxên giran dane.

Hevgirtin û yekîtiyek bihêz ya neteweyî remza serkevtina me hemû Kurdan e. Bila em li sala pêşiya xwe de bo vê yekîtiyê tekoşînek bêrawestan bimeşînin.

# Peyama Rêzdar Mistefa Hicrî Sekreterê Giştî Ê Pdkî Bi Boneya Hatina Sala Nû



**Hemwelatiyên rêzdar**
**Xûşk û birayên hêja!**

Sala we ya nû û newroza we pîroz be. Sala borî salek tijî ji êş û azar û bê parî ji bo tewaya xelkê Îranê û bi taybetî neteweyên zulmlêkirî û yek ji wan neyeweya Kurd bû. Sala 1391'an a Rojî doma salên deshilatdariya rejîma paşvemayî û bîhanî di gel azadî û hemû norm û pirensîpên mirovatiyê ên vî serdemî, wate Komara Îslamiya Îranê bûn.

Cudahiyek ku di vê salê de bi nirxandin di gel salên borî em dibînin ew e ku girtin û serkûta cudahizran zêde bû, rewşa aborî li ber domdana bi siyasetên şaş ên aborî û siyasî li navxwe û li astê navneteweyî de bû sedema zehmettirbûna jiyan xelkê, û encama wê jî, zêdebûna hejmara bêkaran, û zêdebûna cînayet û diyardeyên civakî li Îranê de bû.

Bi sedema siyasetên pirr ji ferq û cuhaîdanînê, beşeke zêdetir bû para Kurdistanê.
Her bi vê sedemê jî bû ku li sala borî de girtîgeh ji azadîxwazên Kurd hatibûn tije kirin.
Hemwelatiyên azadîxwaz û têkoşer! Ew dîmena tal û nexwastî beşek ji rastiya sala 1391'an bû.

Beşek din ji dîmenê vê salê, dirêjiya berberekaniya azadîxwaziyê li hember serhişkî, paşvemayîn û dîktatoriyê li Îranê û li gelek ji welatên dûr û nêzîk ên me de bûn. Li Mîsra piştî Husnî Mobarek û Tunis û bitaybetî Sûriyê, sitûxwarnekirina xelkê li hember dîktatoriyê û razînebûna bi rewşa heyî ku bi ser wan de hatiye sepandin, û herweha hewildana bo anîne serkar ya hikumeta dilxwaze xwe herweha li geşekirinê de bûn.
Li komara Îslamî de em li vê salê de şahidê guhertinê bi qazancê xelkê û lawaziya rejîmê bûn.

Pêkhatina valatiya li navbera bandên mafyayî ên rejîmê ku bi binajoxwaz hatine naskirin li bereberê şanoya hilbijartina dewra dehê ya serkomariyê de, û jidestçûna zêdetir ya rewayiya wilayeta Feqîh ku sitûna vê deshilatê ye, bêdeshilatiya hikumetê û perîşaniya rejîmê li çareseriya kêşeyên aborî, û siyasetên navneteweyî ên şikestxwari û gellek nîşaneyên din, dibêjne me ku serbarê wan hemî sextiyên ku Komara Îslamiya Îranê bo xelkê Îran û herêmê bi dîharî anîne, hêviya gihîştina bi azadî û rizgariyê ne tenê herwa zindî ye, belkû bihêztir bûye, derbaskirina vê yekê jî girêdayî ye bi astê hişyarî û xebata yekgirtî ya neteweyên Îranê bi taybetî neteweya Kurd.

Lewra em li demekê de ber bi pêşwaziya newroza 1392'ê diçin ku baweriya me bi berev pêşveçûna guhertinan û rizgariya xelkê ji destê zul û zordariya komara Îslamî û heta pêkhatina guhertinan li derheq pirsa Kurd bi giştî zêdetir ji salên borî ye.
Bila em vê baweriya bihêz û polayîn bi gurriya agirê ronahî û hêvî û xwaziyên xortên welatê xwe bikne bingeha berberekaniya bihêz bo nehêlana deshilata rejîma Komara Îslamiya Îranê û avakirina hikumeteke dilxwaz ya xelkê têhniyê azadiyê.

Bi boneya newroza 1392'an em pîrozbahiyên herî germ ên xwe pêşkêşî tevahiya gelên Îranê û gelê Kurd li her çar beşên Kurdistanê û bi taybet li Kurdistana Îranê dikin.
Pîroz be newroz ji malbatên şehîdan, û girtiyên siyasî ku li rojên newroz li girtîgehên Komara Îslamî de derbas dikin. Herweha pîroz be ji malbatên girtiyên siyasî ku li wan rojan de, zêdetir ji her demekê bîra hezkiriyên xwe ên girtî dikin.

Bi hêviya salek geş û pirr ji serkevtin ji tewaya azadîxwazan re.

**Mistefa Hicrî**
**01.01.1392**
**21.03.2013**

www.arsivakurdi.org

# Peyama Hevbeş Bi Boneya Newroz Û Hatina Sala Nû

**Hemwelatiyên rêzdar**!
**Xelkê têkoşer ê Kurdistanê!**

**Jin û mêrên azadîxwaz!**

Bi navê PDKÎ û Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê, em pîrozbahiyên herî germ ên cejna neteweyî a Newrozê ji we hemiyan, ên ku newrozê wek cejneke neteweyî dihesibînin û bilind radigrin, bi taybetî xortên neteweya Kurd dikin, û em hêvîxwaz in ku bi xebata hevpar, em newrozê bikne cejna rizgarî û serkevtinê.
Newroz kopka agirîn a xwezayê, û hêmaya serhildan û hêza geşekirin û nûbûnê, carek din berbiniya çiya, deşt û gund û bajaran, bi têhna xetîrên bi gurrî, ên rabûn û berengariyê, dike govenda peşqelên agir, û li ser xalîşînka kelha tarîtiyê, şûreya bilind ya ronahî û destanrêsiyan ava dike.
Dîroka karesatbar a neteweya me bi taybet di serdemê hevçerx de gewahyarê vê rastiyê ye ku çawan vê neteweyê, hertim û piştî têkşikana şoreşan ji aliyê ne hezan ve, waneyên newrozê kirine rêniwînê vejiyan û serhildaneke nû, û waneya azadî û hermanê li çeperên berengariyê de xwendiye.
Li dîroka siyasî ya hevçerx ya welatê me de deshilatdarên Komara Îslamiya Îranê hewil dan ku newrozê bikne boneyek bona bêhnvedan û dûrxistina xelkê li nav malên wan de, ku ew yek dijî bingeh û wateyên newrozê wek karnevalekê bo tebahî û rabûnê ye.
Komara Îslamiya Îranê bi egera naweroka îdeolojîk ya siyasetên xwe, newrozê wek metirsî û astengiyekê li ser riya xwe dizane, lewra bi mifahwergirtina ji tewaya emrazên helandin û tepeseriyê hewl daye ku pêşiya birêveçûna rêûresmên taybet bi vê boneya neteweyî li gund û bajarên Kurdistanê de bigre.
Li vê derheqê de rejîm ketiye nav hewildanan de bona vê ku morala bihêz û baweriya şoreşgerane ya xelkê Kurdistanê bêxe qedeman, û tevî newrozê ku yek ji bingehên şûnasê û faktera yekbûna tev aliyên xelkê Kurdistanê ye, wan bîhanî bike.
Lê berevajiyê hezkirina wan deshilatdaran newrozê li Kurdistanê wek kevneşopiyekee siyasî û civakî ya bi bandor hertim boneyek bona handana xelkê berev tebahî û hevdengî û kombûna li ser bingeha şûnas û derbasbûyiya hevpar û pêşeroja çarenûsê bûye, ku em hêvîdar in her sal ew pêvajo berfirehtir bibe, û ew cejna neteweyî bi coşeke meztir ve bihê pîrozkirin. Lewra em bi hewce dizanin ku sipasiya xwe pêşkeşî tev civatên xelkê Kurdistanê bikin, ku ji gefxwarin û zextên rejîmê netirsiyane û li vê derfetê bona eşkerekirina hesta azadîxwazaneya xwe û nîşandana nerizayetî li hember, siyasetên rejîmê mifah wergirtine.

**Jin û mêrên azadîxwaz ên Kurdistanê!**

Li yek sala borî de, bi berçavgirtina giringiya yekrêzî û hevgirtinê bona pêngavhilgirtina berev kopka serkevtina xebata mafxwazane ya gelê me, em şahidê liv û tevgereke micid û hewlek pîroz ji aliyê xortên we li refa hêzên siyasî ên tevgera azadîxwazane ya Kurdistanê de bûn, ku her bo vê armancê û li pêxema li hev nêzîkbûna wan hêzan, lihevhatineke hevbeş li navbera PDKÎ û Komelê de hate wajokrin.
Wajokirina vê lihevhatinê ji aliyekê ve bû sedema dilxweşiya civatên xelkê Kurdistanê û ji aliyek din ve, bû sedema pêkhatin komek dijkiryarên dûr ji her cure pirensîpeke şoregerî ji aliyê beşek ji kesayetî û aliyên siyasî ên neyarê Komara Îslamiya Îranê ve, ku her du dijkiryar jî hewcehiya pêdagiriya zêdetir li ser cîbicîkirin û berfirehtirkirina xalên vê lihevhatinê zêdetir eşkere dike û dariştina pilan û bernameyên di cihê xwe de, dike erkê li ser milê me li sala pêşiya me de.
PDKÎ û Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê li rastaya hestkirina bi berpirsatiya dîrokî axwe di vê qonaxa hestiyar de bi armanca yekgirtina zêdetir û bihêzkirina hewlên xwe li pêxema armancên neteweyî û demokratîk ên tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd, newrozê dikne hêma û nîşaneya tekoşînê bona bidestveanîna daxwazên rewa ên şoreşa azadîxwazane ya Kurdistanê.



**Gelî hemwelatiyan!**

Li sala borî de bendîxaneyên Komara Îslamiya Îranê wek hertim bûne cihê hewara cesûrane ya polayîn ya xortên xebatkar ên we, ku yasaya jiyana koletiyê binpê dikin û berengarî dêwê kevneperestî û dîktatoriya zal bi ser welatê me de dibin.
Em pêdagiriya li ser maf û azadiya xortên girtî ên nîştimana xwe li hemberî celadên wilayeta Feqîh wek erkê li ser milê her aliyekê dizanin. Li newroza evsal de hewce ye ku em dengê nerizayetiya xwe li hember siyaseta tepeserkerane ya rejîmê yekgirtî û bilindtir ji salên borî eşkere bikin û daxwaza azadkirina girtiyên siyasî û çalakên warê ferhengî û medenî li girtîgehên rejîmê wek duruşma serekî ya xelkê Kurdistanê bilin bikin.

Bila em newroza evsal bikne derfetek bo berevanî ji tekoşerên azadî û serfiraziya neteweya xwe, û bi xebat û helwesta hevpar nîşan bidin ku dîwarê girtîgehên rejîmê gellek ji vê kurttir û lawaztir in ku hewara cesûrane ya qehremanên Kurd, li pêxema maf û azadiyên xelkê Kurdistanê de bêdeng bike.

**Malbatên serfiraz ên şehîdan!**

Xebata pêdagirane û emegdariya we, li hemberî rêbaza pirr ji serfirazî ya xeortên şehîde we, serbarê tev zext û givaşên dezgehên tepeserkar ên Komara Îslamiya Îranê, li heyamê zêdetir ji sê dehikan temenê biyûm ê vê rejîmê de, bûye sedema şanaziya me û dilgermiya zêdetir ya me bona domandina xebatê heya gihîştina bi armancên bilind ên şehîdên riya rizgariya neteweya me.
Em li vê boneya nîştimanî ya pîroz carek din morala xweragirî û bilind ya we, û emegdariya we li hember rê û şopa xortên we, dikne navika hevxebatî û tekoşîna xwe ya hevpar û hêvîdar in ku bi çirrkirina hewlên hemû azadîxwazên gelên Îranê, em evsal bikne sala bidestveanîna hêviyên bilind ên tewaya cangoriyên riya azadiya Kurd û Kurdistanê.

**Komeleyên xelkê Kurdistanê!**
Cejna newroza evsal li demekê de birêve diçe ku Komara Îslamiya Îranê li hemû warekî de di gel kirîz û alozî û serûbin bûna hêz û deshilata xwe berbirû bûye û li demên herî aloz ên temenê xwe li heyamê wan çend salên borî de derbas dike.
Beşeke berçav ji zexta wan tehrîmên aborî û gendelî û birêveberiya talançiyane ya deshilatdarên rejîma Îranê dikeve...

Dom R: 4'ê

www.arsivakurd.org

Doma: R 3'ê

Nebûna derfeta kar, enfilasyona (tewerom) aborî, dabezîna nirxa diravê Îranê li hember diravên bîhanî, daxistina kargehên aborî û pîşesazî û ...hwd, astê nerizayetiya xelkê li hember siyasetên rejîmê gihandiye asta herî jor, bi awayekê ku deshilatdarênrejîmê jî nikarin nigeraniya xwe li egera teqîna nerizayetiyan veşêrin. Li rewşeke weha de ye ku tevgera azadîxwazane ya Kurd li hemû beşên Kurdistanê, li pêvajoyek bilez ya berev pêşveçûnê de ye, û doza rewa ya neteweya me li hemû parçeyên Kurdistanê berev arasteya desteberbûna pêngav bi pêngav ya mafên xwe li pêşkevtinê de ye.

Li Turkiyê hewlên çareseriya pirsa Kurd bi destpêkirina qonaxeke dilxweşker ji gotûbêj û diyalogê li navbera hikumet û nûnerên bizava neteweyî ya Kurd, rolek nû, û hêviyek bo serkevtina xebata Kurd li vê beşa Kurdistanê de nîşan dide. Li Sûriyê xebata gelên vî welatî bona herifandina rejîma dîktator ya malbata Esed, derfetek baş bona desteberbûna mafên gelê Kurd li vî welatî de pêk aniye. Li başûrê Kurdistanê jî serbarê hinek kêmûkasiyan vê herêmê berev pêşçûneke berçav bi xwe ve dîtiye û beşek diyar û giring ji mafên gelê Kurd li başûrê Kurdistanê hatine desteber kirin.

Li Kurdistana Îranê jî Komara Îslamiya Îranê li hemû herêmên din ên Îranê, bi sedema rewşa siyasî û hişyriya neteweyî ya xortên Kurd, ketiye nav tirsekê de, û bi vê sedemê jî zêdetirîn hêza tepeserkar aniye nav gund û bajarênKurdistanê de. Di ciyê xwe de ye û erkê li ser milê me hemiyan e ku li rewşeke weha de em alîkarê tekoşerên riya xebat bona dabînkirina maf û azadiyên gelê xwe bin û bi her şêweyekê ku ji dest me tê, em xizmeta pêvajoya berrev pêşveçûna xebata azadîxwazane ya neteweya Kurd li Kurdistana Îranê de bikin.

**Gelî jin, ciwan, kedkar, xwendekar û xelkê tekoşerê Kurdistanê!**

Bila em li newroza evsal de serdana malbatên serbilind ên şehîdan û bendkiriyên siyasî bikin. Bila li vê boneya pîroz de, em xebat û tekoşîna wan ji bîr nekin, û sozê bi wan re nû bikin ku riya pirr ji şanaziya wan bidomînin, û bi malbatên serbilinde wan û bi xelkê xebatkar ê Kurdistanê ragehînin ku heya bidestveanîna mafên rewa ên xwe em palpişt û hevpêngav û hevdengê wan in.

**Serkeve xebara rizgarîxwazane ya gelên Îranê**
**Her bilind be alaya xebata hevgirtî ya neteweya Kurd li Kurdistana Îranê**

**Cejna neteweyî ya newrozê li we pîroz be**

**Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê, û**
**Partiya demokrat a Kurdistana Îranê**
**Newroza 1392**
**2713'an a Kurdî**

# Kuştara bi kom li gundên Nexedê

Hîwa Mîrzayî





Piştî serkevtian şoreşa gelên Îranê û bi deshilatgihîştina rejîma Komara Îslamiya Îranê, pêla mafxwaziya gelên Îranê û daxwaziyên wan li gel dijatiya rejîma ku taze hatibû ser kar berbirû bû., û heta sozên deshilatdaran di pêvajoya şoreşê de hatin jibîr kirn û ne tenê eva belkû êrîşek bêrehmane kirina ser kesên pêşkevtinxwaz û demokrat û neteweyên mafxwaz ê Îranê. Hikumeta Îslamiya Îranê wek her rejîmeke dîktator ya cîhanê riya mana xwe di tepeseriya her dengek azadîxwazane de didît, lewra Xomênî rêtina xwîna Kurdan bi helal zanî û fitwayek bi dijî Kurdan derkir û şerek bi ser gelê Kurd de sepand ku sê mehan dom kir.

Piştî şerê sê mehî jî li salên piştî vê êrîş berdewam bûn bi awayekê ku li encama vî şerê giran de gundên "Helebê", "Kiwêkan", "Kerêzeyî Şikakan", "Yunislî", ser bi Nexedê jî li 23'ê Reşemeya 1361'an de ketin ber êrîşê, û li encam de 40 kes ji xelkê wan gundan bi awayek bêrehmane hatin şehîd kirin. Ew tawan doma wan cînayetan bû ku rejîma Îranê li gund û bajarên Kurdistanê encam dabû wek Pawe, Seqiz, Mehabad, Qarnê, Qelatan, û gellek gund û bajarên din ên Kurdistanê. Armanca rejîma Îranê ji kuştara xelkê herêma Nexedê, çavtirsandîkirina wî xelkî bû ku piştevanî ji hêzên demokrat û mpêşkevtinxwaze Kurd dikirin. Herweha pêkanîna nakokiyan û çandina tovê duberekî û nakokiyê li navbera Kurd û sAzeriyên vê herêmê bû ku bi xweşî ve siyaseta durust û mentiqî ya PDKÎ û bilindbûna astê têgihîştina xelkê vê herêmê heya astekê pêşiya vê siyaseta rejîmê girt.

Kuştara xelkê gundên Nexedê tenê bi sedema Kurdbûna wan bû, ew karesatên ne mirovî bi sedema nebûna ragehyandinên giştî, û herweha bi sedema şerê Îran û Îraqê dengvedanek weha li nav mîdyayên cîhanê de tunebû, heya ew hêz û kesayetiyên ku duruşma dadperweriyê didan, tu dijkiryarek nîşan nedan, û mixabin heya niha jî tu yek ji tawanbaran berbirûyê dadgehê nebûne, belkû heya paye û pileyên bilind jî wergirtin.

Lewera bi sedema wan zext û zulm û zoriyan, û ji aliyek din ve bi sedema astê têgihîştina siyasî a nbilind ya Kkurdan, Kurdistan her tim çepera azadîxwazî û şoreşê bûye.

Siyaset zulm û zorî û tepeseriyê her niha jî mixabin ji aliyê rejîma Îranê ve derheq rewşenbîr, rojnamevan û çalakên medenî ve tê birêvebirin, û ji aliyek din ve bi hêlana herêmêm Kurdan di nav hejariyê, û bilavkirina madeyên hişber li nav civakê de berdewam e, û şêweyek din ji komkujiya xelkê Kurdistanê li rojevê de ye.

## Bo Cara Yekemîn Di Sûriyê De Çeka Kimyayî Hat Bikaranîn



Nûçegehaniya Elerebiyê eşkere kir ku roja Sêşemî 10.3.2013 mûşekek xwediyê jehrên kimyayî bi derdora bajarê Helebê ketiye û di encam de 16 kesan canê xwe jidest da û pitir ji 68 kes ji birîndar ketin.

Omran Elze'bî wezîrê îtilaata Sûriyê regehand ku ev mûşeka han, ji aliyê dijberên dewleta Sûriyê ve bi armanca lêxistin ji bajarê "Xan El'esl" hatiye avêtin.

Di hember de jî "Qasim Sededîn" yek ji fermandeyên payebilind a Artêşe Azad, serbarê retkirina gotinên wezîrê îtilaata dewleta Sûriyê, ragehand ku mûşeka han ji aliyê hêzên ser bi Beşar Esed ve li bajarê Xan El'esl hatiye xistin.

Heyamê du heftî berî niha akadimiya polîs a Xan El'sel ku ji aliyê hêzên ser bi Beşar Esed ve weke topxane li dijê şoreşglran dihar bikar anîn, ket bin kontrola hêzên dijberî dewleta Esed.

www.arsivakurd.org

## Em komkujiya Gêçê, ji bîr nakin

Gêçê li herêma somayê ser bi bajarê Ûrmiyê herdem melbendeke demokratperwer bûye, ji ber vê yekê berdewam ketiye ber kerb û kîna rayedarên azadîkuj ên Komara Îslamî a Îranê.

Piştî şerê giran yê Pira Cohniyê, di 02.01.1362(1983)'an de gundê Gêçê şahidê êrîşa herî hovane a Komara Îslamî bo ser hemwelatiyên sivîl ên vî gundê bakurê Kurdistana Îranê bû.

Di encama êrîşa pasdaran de de, 13 kes ji xelkê gundê Gêçê hatin kuştin. Xincî Pêşmergan ku di vê bûyerê de şer kirin, gundî bêy ku şer bikin, hemû di malên xwe hatin derêxistin û piştre jî hatin gullebarankirin. Lê xala balkêş, awayê şehîdkirina gundiyan bi destê Pasdarên Komara Îslamî a Îranê bû.

Piştî vê ku çend kes ji gundiyên sivîl û bêguneh bi rehîn tên girtin, bê tu pirs û bersivek û heta dadgehîkirinekê, têne gullebarankirin, ku eva ji hemû exlaq û pirensîpeke mirovî bi dûr bû, û ev cinayeta Pasdaran weke yek ji wan komkujiyên li dijî gelê Kurd tê hesibandin ku wan di karnameya xwe ya tejî cinayet û mirovkujiya welatiyên sivîl de tomar kiriye.

# Pdkî Û Avakirina Kongireya Neteweyên Îrana Federal

Dara Natiq



Li 20'ê Şibata sala 2005'an de PDK Îranê li pêngavek dîrokî de bo yekem car li dîroka tevgera rizgarîxwazane li Îranê de piştî hewil û tekoşîneke berfireh û bê rawestiyan bi beşdarî û amadebûna komek rêkxiraw û kesayetiyên azadîxwaz ên ser bi neteweyên Îranê, pêkanîna kongireya neteweyên Îrana federal ragehand.

Bi berçavgirtina vê rastiyê ku pêkhateya Îranê ji şeş neteweyên sereke wate Fars, Kurd, Turkemen, Turkên Azerî, Ereb û Belûçan pêk hatiye, û neteweyên bindest ên Îranê nêzîk bi nîva nifûsa vî welatî pêk tînin, mixabin siyaseta hikumetên Îranê çi li serdemê Pehlewî û çi jî li serdemê Komara Îslamî de li hemberî neteweyan, siyaseta yekdest kirin, û helandina ferhengî û têkdana nifûsa herêmên akincîbûna neteweyên din bi qazancê neteweya serwdest bûye.

Kongireya neteweyên Îrana Federal wek nawenda bihêz ya komkirina hêz û rêkxirawên çalak û demokratîk di heyamê çend salên borî de, hewil û tekoşîneke bê rawestiyan bo nasandina rastiya civaka Îran, û çend netewî bûna vê civakê daye û karî ye ku rûçikê kirêt yê komara sêdare û siyaseta serkût û asîmîlekirina neteweyên Îranê ji aliyê vê rejîmê ve bo raya giştî eşkere bike, û di hemen dem de bibe navika yekrêzî û hevahengbûna neteweyên Îranê.



Bê guman ew hevpeymaniya sitratejîk û yek-girtina di navbera neteweyan de, bandorek erênî û berçav li ser pêvajoya niha û pêşerojê a xebat ji bo bidestveanîna azadî û demokrasiyê, û dadperwerî û mafê wekhev bo tewaya neteweyên Îranê dibe. Berevajiyê dujminên azadî û yekbûna neteweyên Îranê ku propagendeyên nerast û bervajî bi dijî vê kongireyê rê dixin, ew kongireya ne tenê her bo dijayetiya bi neteweya Fars re pêk nehatiye, belkû rêkxiraweke berevankar ya mafê Farsan e jî, û bo îraneke deokratîk û federal bi tewaya neteweyên wê ve ku yek ji wan neteweya Fars e xebatê dike.

Avakirina kongireyek weha altirnatîvek îdeal û bihêz e bo bidestveanîna mafên wekhev di navbera tewaya neteweyên pêkînerê welat û cihgirkirina demokrasî û retkirina her cure kulturekê bo asîmîlekirina netweyan û siyaseta bingehxwazî û yeknetewebûn û yek dewletbûn li Îrana çend netewe û çend kultur de.

Bi baldan bi derbazbûyiya siyasî a Îranê li serdemê hevçerx de ku tu demekê mafê neteweyan têde berçav nehatiye girtin, hebûna sîstema federalî ya netewî -coxrafî sîstema herî baş e bona pêkanîna yeksanî û gihîştina bi mafên netewî û mafê diyarî kirina çarenûsê di Îranê de. Lewera hewce ye ku tewaya azadîxwazên welatê me û tekoşerên warê mafê netewî tevî hewildan bo bihêzkirina kongireya neteweyên Îrana federal û zêdetir nasandina rastiya civaka Îranê wek welateke çend netewe bo raya giştî, hewce ye ku pêdagirî li ser mafê xwebirêvberiya neteweyan li çarçoveya Îraneke azad û demokratîk û federal de bike.

## Nerîna Lîderan



Mesûd Barzanî

Helebçe bû qurbanî, lê girêya bextê Kurdan vekir, û em hemû qerdarê Helebçeyê ne.




Barak Obama

Destpêregihîştina rejîma Îranê bi çekên navikî xeta sor ya Amerîkayê ye, jiber ku ew kar gefek li ser ewlehiya Amerîka, Îsraîl û cîhanê ye.



Malik Elkurdî

Bona derkirina Kurdan, emê herne nav bajarê Efrînê, jiber ku divêt PYD helwesta xwe zelal bike.



Selahedîn Demîrtaş

Yên ku nedihêlan em li ser xaka xwe newrozê pîroz bikin, îro em li xaka wan, newroza xwe pîroz dikin, lewra em sipasiya tekoşerên xwe dikin ku rojek weha ji me re afirandin.

www.arsivakurdi.org

# Panaromaya 21'Ê Adara 2012, Heta 21'Ê Adara 2013 (1391'An A Rojî)

A: Arif Velzî



### 25'ê Îlona 2012'an

kongireya 15'emîn a PDK Îranê li jêr navê kongireya Dr. Sadiq Şerefkendî bi beşdariya endamên kongirê û hejmarek ji mêhvanan li binkeya Deftera Siyasî a Partiyê dest bi karê xwe kir, û Piştî 6 rojan karê berdewam, di roja 5ê Çiriya Pêşîn de kongirê bi serkevtin ve dawî bi karên xwe anî.





### 21'ê Tebaxa 2012

Rêkevtinnameya alîkariyê di navbera PDKÎ û Komeleya Şoreşgêr a Zehmetkêşên Kurdistanê, ji aliyê rêzdaran Mistefa Hicrî û Ebdulla Muhtedî ve hate îmzakirin.


### Çiriya Paşîn a 2012'an

Heyetek PDK Îranê bi serperestiya Loqman ehmedî endamê komîteya nawendî û berpirsê peywendiyên derve ên partiyê, beşdarî di 11'emîn kongireya UNPO li bajarê Jinêvê de kir. Di vê kongireyê de herweha rêzdar Ebdula Hicab nûnerê PDKÎ di UNPO de, weke endamê desteya serokatiya UNPO'ê hat hilbijartin.



### 15'ê Sermaweza 1391

li xwendingeha gundê Şînawê a ser bi bajarê Pîranşarê, bi sedema agirgirtina sobeya naftî a pola çaremîn a despêkî, 36 zarokên keç ên dersxwan di nav dûmana û agir de şevitîn, ku du ji wan zarokan bi sedena giraniya birîna xwe canê xwe ji dest dan.





### 9'ê Çileya Paşîna 2013

sekîne Cansiz yek ji endamên avaker a PKK û Fîdan Doxan nûnera KNK, û Leyla Soylemez çalaka siyasî li Parîsê hatin terorkirin û sibêdehiya roja paştir termê goriyên vê terorê hatine dîtin.




### 18'ê Çiriya Paşîn a 2012

Piştî 68 roj gireva birçîbûnê, 682 girtiyên Kurd di 67 girtîigehên dewleta Turk de, li ser daxwaza Ebdullah Ocalan davî bi gireva xwe anîn. Yek ji daxwazên serek ên girtiyên Kurd berevanîkirina ji xwe di dadgehên turkiyê de bû.

### 26'ê Gelawêja 1391

(Tebaxa 2012), Erdhejeha wêranker a 6.2 rîştêrî herêmên Eher, Herîs û Werzeqan a ser bi Parêzgeha Azerbaycana Rojhelat da ber pêlên xwe. Li gorî serhejmêriyên nefermî pitir ji hezar kesî canê xwe ji dest dan.



# "Belûç" Çavkanî Ji Dîrok Û Çanda Belûçiyan Werdigre

Di wan çend rojên borî de ku pirsa parvekirina parêzgeha Sîstan û Belûçistanê bi ser çend beşên cuda de, û herweha guherîna navê vê parêzgehê ketiye rojevê, alîgir û dijberên vê yekê bi awayên curbicur bîrûraya xwe anîne ber bas. Her di vê derheqê de dijkiryara herî tund, dijkiryara Mewlewî Ebdulhemîd Zêhî, pêşnimêjê Suniyên parêzgeha Sîstan û Belûçistanê li roja Înê 3'ê meha Adarê de bû ku got: " Belûçistan di dirêjahiya dîrokê de beşek ji nasnameya me Belûcan bûye, lewra jî hinek alî hene ku dixwazi pirsa neteweyan li Îranê de kêmreng û piştre jî ji tune bikin.




Lewra em wan kesan wek dujminê xwe dihesibînin û divêt nûnerên parlementoyê jî li hemberî pirsek weha de bêdeng nemînin, hekî ne, xelkê me tu car wan nûneran efû nakin".

Herçend ku li gorî îdiaya deshilatdarên rejîma Komara Îslamiya Îranê, parvekirina parêzgeha Sîstan û Belûçistanê dibe sedema vê ku deshilata îdareyan û rêkxirawên ser bi wan îdareyan berfirehtir bin û berpirs bikarin bi awayê rasterast li gel paytext û wezaretxaneyan û rêkxirawên ser bi wezaretxaneyan û rêkxirawên ser bi wan wezaretxaneyan pêwendiyê bigrin û bikarin budceyek zêdetir wergirin, û îmkanatên warê perwerdehiyê zûtir bi dest bixin, lê di rastî de dema ku em dibînin ew herêm di 33 salên borî de kêmtirîn giringî ji hêla deshilatdarên Îranê ve, pê nehatiye dan û ew herêm di warê çandî û aborî de paşve maye, û dema ku ji dîtingeha berpirsyarên hikumetî ve xelkê Belûç wek hemwelatiyê pile du têne dîtin û tawan û sûçê wan jî Sunî û Belûç bûne, û xelkê vê herêmê neçar in ku weha bifikirin ku rejîma deshilatdar bi terh û projeyek weha dixwaze neteweya Belûç ku bi ser Îran û Efxanistan û Pakistanê de hatiye parve kirin, di navxwe de jî bi ser çend beşên cuda de parve bike, û bi vî awayî pirsa neteweyî kêmreng, îmkana binçavkirina çalakvanên Belûç zêdetir û li dema her meşeke nerazîbûnê de bi hêsanî wan tepeser bike.

Lewra heke navê parêzgeha Sîstan û Belûçistanê, bihê guherîn, bi vê yekê ne tenê kêşe nahêne çareserkirin, belkû berevajî veha dixuye ku nerizayetiyên di vê herêmê de bigîje astek herî bilind û neteweya Belûç pêdagirtir ji caran li hemberî wan hemû ferq û cudahiya deshilatdarên rejîmê de, xebata xwe ya rewa di çarçoveya xebateke medenî de bidomînin.

Guhragirtin û hewildan û tekoşneke rastîn û micid û bi kiryar bo çareserkirina kêşeyên mesebî û neteweyî di vê herêma bêpar ji îmkanatên çandî, aborî û ...hwd, tenê riya vegerandina tenahî û aramiyê bo vê herêmê û pêşgirtina ji serhildana girûpên tundrewên netewexwaz e, ku ew jî pirr zehmet e ku heya rejîma Komara Îslamiya Îranê – ku bixwe afirînerê vê rewşa pirr karesat e– li ser kar be, bihê cîbicî kirin.

Şehab Xalidî






## Rojev

### Pêngavek Girîng

Selîm Zencîrî

Azadkirina 8 dîlên Turkiyê ji aliyê PKK'ê ve bê şert û merc li pêşberî ragihandinên cîhanê di roja 13'ê Adarê de dengvedanek mezin di asta cîhanê de çêkir û bi taybetî rojeva siyasî a Turkiyê dagirt.

Kiryarek ku weke gavek girîng û dîrokî di alîkarîdana bi pêvajoya nûdestpêkirî re tê hesibandin. Pêvajoyek ku nîşan dide ku aliyê hemberî kurdan jî çi bi zanebûn û lojîk ve û çi jî bi cebra zeman re neçar maye ku vê pirsgirêkê çareser bike.

Rast e ku carê nekariye nîgeranî û tirsa kurdan ji dolab û siyasetên xapandinê verevîne, lê ya girîng ew e ku ev gav tê wateya destek dayîna bi pêvajoyê û ji aliyek din ve jî karek tam mirovî ye û niyetpakî û aştîxwazbûna kurdan derdixe holê.

Serbest berdana wan dîlan piştî wan hevdîtinan tê ku vê dawiyê li navbera birêz Ocalan, serokê girtî ê PKK bi şandeyên BDP're hatiye encamdayîn û ew yek weke bersivek erênî bi xwast û nexşeriya wî tê dîtin.

Ji ber ku şandeya sêyemîn bo çûyîna Îmraliyê jî di rojevê de ye û herweha qerar e ku Ocalan daxwaza agirbesê ji her du aliyan bi taybetî PKK'ê bike. Bêguman bêdengkirina çekan û rawestandina şer û operasiyonan jî dikare lezatî û alîkariyek baş bide pêvajoyê.

Ew destpêşxeriya aştiyane a PKK'ê nabe ji aliyê dewlet û hikûmetê ve bê bersiv bimîne û bona wê ku cidiyet û semîmiyeta xwe zêde nîşan bidin, dibe gavek hevsêwe bona pêşvebrina pêvajoyê bavêjin. Her weke Ehmed Turk, siyasetvan û hevserokê KCD anî ziman, aliyê kêm wan parlemantar, şaredar û girtiyên siyasî ên kurd ku li çarçoveya doza KCK'ê de hatine zîndanîkirin serbest berde.

Lewma çawa raya giştî û bi taybet malbatên wan girtiyan bi azadbûna xortên xwe dilşa bûn, bi heman awayî kurd û malbatên girtiyên kurd jî vê dilşa û hêvîdar bibin.

Bêguman ev gava han dikare hevdem li gel ragihandina agirbendê ji aliyê her du aliyan ve bibe hêvênê hêvîdariya zêdetr bi pêvajoya aştiyê û serketina gav bi gav a wê, heya çareseriya pirsa kurd.

Lewma hewce dike her du alî jî pir bi baldarî, hestiyarî û berpirsatî ve tev bigerin û nekevin davika şerxwaz û neyarên aştiyê ku jêre di boseyê de ne.

www.arsivakurd.org



# Mehmûd Axayî kurê Selîm naskirî bi Sofî Mehmûd, sala 1281'an a Rojî li gundê "Giwê Axac" a dewera Hewşarê hatiye dinê.

Hevpeyvîn:Faxir Molûdî

Sofî Mehmûd dibêje her di zarokatiya xwe de tê bîra min ku bavê min du gayên cotkirinê hebûn û min jî tevî wî karê cotkariyê dikir. Sofî dibêje ku tê bîra min dema Amerîka û Berîtaniya hatin û welatê Îranê dagîr kirin. Rojekê hindek ji serbazên artêşa Berîtanyayê li dîkila min xistin û kuştin, ez pir giriyam, bona vê ku min razî bikin yek ji wan serbazan 1 Şayî diravê wî çaxî da min, û ez reviyam mala xwe û min ji bavê xwe re got ku di cihê dîkilê de dirav dane min.



Sofî Mehmûd dibêje ez bona kedkariyê diçûm piraniya gundên derdorê, rojekê min li gundû Gelaz a ser bi bajarê Şinoyê kar dikir ku xelkê deverê bas ji Komeleya Jiyanewe Kurd (J-K) û avakirina hikûmeta kurdî dikirin. Piştî sê rojan min biryar da ku vegerim mala xwe û take Çêleka malbata xwe bona kirîna tifenga Sêtîr bifiroşim. Serbarê nerazîbûna malbatê min Çêlek bi sê Tûmenî firot û çeka Sêtîr bi 15 Qiranî kirî û bona pêşmergatiyê ber bi bajarê Mihabatê ve çûm.

Heyamê şeş heyvan bû ku ez li Mihabadê dimam dema Mela Mistefa Barzanî bi xwe û çekdarên xwe gehişte bajarê Mihabadê. Piştî çend heyvan hikûmeta nawendî êrîş kir ser me û şer çê bû. Heyamê sê heyvan şer dom kir û di encam de me nekarî di hember dujmin de bisekinin, lewra me şikest xwar û her li wir me çekên xwe xistin bin axê de, û em vewgeriyane malên xwe.

min Çêlek bi sê Tûmenî firot û çeka Sêtîr bi 15 Qiranî kirî û bona pêşmergatiyê ber bi bajarê Mihabatê ve çûm. Heyamê şeş heyvan bû ku ez li Mihabadê dimam dema Mela Mistefa Barzanî bi xwe û çekdarên xwe gehişte bajarê Mihabadê.

Sofî Mehmûd li dor tevlîbûna xwe bi PDK Îranê re weha ji me re axivî: "Binkeya Deftera Siyasî ya PDK Îranê li Mîravaya Serdeştê de bû. Li vir bi awayek fermî bûm pêşmerge û herweha di dema şerê sê mange de ez li Hewşar û Sinê bûm.

Sofî Mehmûd Axayî derheq jiyana xwe a Hevpar dibêje ku min şeş Tûmen da kurê Meta xwe û min gotê keça xwe bide min, wî daxwaza min pejirand û bi vî awayî keça xwe bi hespê ji min re anî. Ez hez dikim vê yekê jî bînim ziman ku, berî ku jiyana hevpar pêk bînim, min û keça mamê xwe pir ji hev hez dikir, lê mamê min keça xwe neda min.

Mam Sofî dibêje rojên herî nexweş ên jiyana min rojên şehîd ketina her du rêberên mezin Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî bûn, jiber ku PDK Îranê bê serperest, bê bav û bê rêber ma. Di hember de tewahiya wan rojan ku hêza pêşmerge têde serkevtin bidest dixistin, bo min rojên pir xweş bûn.

Lê yek ji wan rojên herî xweş eva bû ku, rojekê li Kanî Mêwê min nobedarî dida, Dr. Qasimlo hat û ez dîtim û ji min re got çima tu weke nobedar hatî nivîsandin? Min jî di bersiva wî de got ez nizanim qurban, her di vê rojê de berpirsê binkeya me guherî û bi tewahiya binkeyan ragehand ku bi sedema vê ku Mam Sofî Xwediyê temenek zaf e, nabe weke nobedar bê nivîsandin û dibe rêz jî jê bê girtin. Herweha rojek din li Gewredê, ez çûm ku ji kaniyê avê bo pêşmergan bînim, Dr. Şerefkendî ez dîtim û ji min re got mam Sofî çi dikî? Min jî got li kaniyê avê bo pêşmergan tînim, Dr. Şerefkendî got ku eva ne karê te ye, û pêşmergên din dibe vî karî bikin. Her di wê rojî de civînek bo tewahiya binkeya me pêk anî û di civînê de ragehand ku erkê ser milê me hemûyan e ku çavê me ser Mam Sofî be.

Sofî Mehmûd go ku çavnihêriya min ji PDK Îranê ew e ku li ser piyê xwe bisekine, da ku bikare xelkê xwe ji bindestiyê rizgar bike û serkevtinê bidestve bîne. Hemû pêşmerge û kadrên PDK Îranê bav û birayên min in, lewra hemûyan haydar dikim ku elinda me pir ronahî ye, û em jî di demek nêzîk de wê serkevin.

Ez tewahiya xelkê Kurdistanê jî xatircem dikim ku hekî em zêdetir pişta xwe bi xebata xwe girê bidin û çavê me ji welatên din nebe, welatê me wê rizgar be.

Di dawiyê de jî newroza Kurdî ya Îsal ji kadr û pêşmerge û endamên Deftera Siyasî û Kak Mistefa Hicrî û tewahiya xelkê Kurdistanê pîroz dikim.

## Jina Xwediyê 5 Mêran Jî Peyda Bû



Li bakûrê welatê Hindûstanê û li bajarê "Dehradun"ê, keça 21 salî bi navê "Roja Verma" bi 5 mêran ku birayên hev in re zewicî.

Roja xwediyê kurek du salî ye, lê nizane ka gelo bavê kurê wî kî ye, lewma di vê derheqê de dibêje ku; "Ez nizanim bavê zarokê min kî ye, lê tu girîngiya vê mijarê ji min re tuneye".

Roja Varme herweha dibêje ku min jiyana xwe ya cinsî jî li gor pilanek hevpar darêtiye, bi awayekê ku her şevê tevî yek ji mêrên xwe dirazêm û karê cinsî dikim.

"Bajju" ku yek ji mêrên "Roja"yê ye, dibêje; Em hemû bira li bendê ne ka gelo kengî vê goviya me bê û em şevê bi "Roja"yê re derbas bikin.

Roja derheq jiyana xwe ya hevpar dibêje ku ez pir zêdetir ji jinên din digel elaqe û evîndariyê re berbirû dibim û pir zêdetir têm hezkirin, lewma ji jiyana xwe pir hez dikim.




Li gorî medyayên Qeterê ew sîmkarta han, sîmkarta herî giran a cîhanê ye ku bi 2.75 milyon dolarî hate firotin

# 24'Ê Reşemê Destpêkek Nû Di Xabata Jinên Kurdistanê De



İlham Çayçî



Avakirina Rêkxirawa Jinan li serdemê Komara Kurdistanê de, wek yek ji rûpelên bi çirûsk û geşê li dîroka kurt a Komara Kurdistanê tê hesibandin, ku ne tenê ji hêla jinan ve, belkû ji hêla tewaya tex û qatên civala Kurdistanê ve wek şanaziyeke serdemê komara Kurdistanê tê hesibandin.
Avakirina Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistana Îranê di vî warî de pirr giring e ku di vê serdemê de ne tenê hejmara wan jinên ku dikarîn di qada siyasî a Kurdistanê de bandor hebin, ji tiliyên destan derbaz nedibûn, belkû civaka Kurdistanê bi taybetî jin piranî nexwendewar bûn, û ji aliyek din ve di nav lepê kevneşopiyên serdestiya mêr de mabûn û nedikarîn tu guhertinekê di rewşa xwe ya heyî de pêk bînin.

Lê bi avakirina Komara Kurdistanê û hilbijartina Pêşewa Qazî Mihemed wek serkomarê Kurdistanê, hêvî û baweriyê di nav dilê civakê û bi taybetî jinên Kurdistanê de çilo da, û bi avakirina YJDK wek yekemîn deskevt ji bo jinên Kurdistanê, jinên Kurd bi piştevaniya avakerên Komara Kurdistanê û malbata Qazî Mihemed, wek hevjîn û keçên wî ku li avakirina YJDK de rol hebûn, bo yekemîn car di gel çalakioyên çandî û siyasî nasyar bûn, û bi bihurîna demê, bi çalakiyên di vê rêkxirawê de ji giringiya xwendin, perwerdehiyên curbicur, jêhelbirina hişyariya siyasî, û nasyariya di gel mafên mirovî hesiyan, û li encam de pê danîne nav qada siyasetê de.

Her di vê rasteriyê de Pêşewa rê da hevjîn û keçên xwe da ku li YJDK de kar bikin û bi sedema hitbara zêde ya Pêşewa di nav xelkê de, û giraniya kesayetiya wî ya mesebî û siyasî, hitbar li navbera YJDK û mêran de jî pêk hat, û jinan karîn bi hêsanî herne nav refên YJDK de.

Herçend xebata jinan zêdetir ji sedsalekê ye ku dom dike, lê jin li wan sê dehikên deshilatdariya rejîma Komara Îslamiya Îranê de di nav êş û zehmetî û zexta herî zêde de ne. Ew zext û givaş di astekê de ye ku jin neçar dibin welat bi cih bihêlin û rû bikne derveyî welat û li nav refên partî û saziyên siyasî de cih bigrin da ku bi vî awayî bikarin bigîjin mafên xwe. Tevgera jinan li hemberî wan hemû bêedaletiyan de her zindî ye û ew zindî bûn bi awayên curbicur xwe di nav mal, zanîngeh, û cihên curbicur de xwe nîşan dide.

Di rastî de niha civaka me hewcehî bi jinên çalak û zana bo gihîştina bi mafên wekhev heye. Hebûna jinan di nav refên rêkxistina YJDK û partiyên siyasî, bona kurtkirina riya gihîştina bi armancên xwe hewce ye.

eva yek ji erkên sereke ên YJDK ye ku bi hşyarkirina jinan li warên siyasî û civakî de, hewil bide jinan bigehîne asta herî bilind, û riya gihîştina bi mafên wan nîşanî wan bide. Bê guman YJDK di vî warî de wê berdewam be li ser xebat û tekoşîna xwe.

www.arsivakurd.org

# Adar Bi Agirê Newrozê Xweş E

Ebdulla Hicab



Adar! Heyva serhildanên mezin, berxwedanên bi heybet, dema geşbûna çirûskên roniyê, bizdiyana tarîtiyê, xurtbûna hez u îradeya gel bo azadiyê, destpêka vejîna jînê û vegeşîna hêviyên serkevtinê li welatê Newrozê.

Adar! Heyva birîna Helebçê, destpêka rûreşiya herî mezine dîroka dagîrkerî li Kurdistanê êrişên bednave Enfalan, bizmarên li dora sindirukên Qaziyan, dojehbarana li Sine, qêrîna Amedê, hejîna Cizîrê, hawara Qamîşloka têniyê kelejana azadiyê.



Adar! Êş û azara dîroka bi xwîn ya bihişta ser rûyê zewiyê, nasnameya Kurdistanê, nîşaneya hebûna netewa Kurd û dîroka kevnare welatê Kurdan, guriya agirê azadiyê, demsala Newrozê,
Adar! Xakelêweya xatûna sertancê hemû heyvên salê, tu bi xêr hatî.

Adar! Ji te re basî çi bikim? Basî camêrî û canejiniya keç û xortên Kurdistanê ku bê tirs ji reşên şevê xwe davêjin bersinga çiya û newalên welat û bi agirê Newrozê bi xêrhatina te dikin, an basî namerdiya dagîrkeran ku dixwazin agirê Newrozê vemirînin û nehêlin ku tu bi mêvanî jî bêy wargeh û meskenê xwe yê ku ji dil te hez dike!

Adar! Îsal dubare de demekê de ku Kurdistan xwe ji bo pêşwaziya sersal û serkevtinan û bi bîranîna bûyerên ku te di nava dilê xwe de veşartine amade dike û gelê Kurd bi vêxistina agirê kulekşarşemiya dawiya salê, di serî de diçe pêşwaziya Newrozê, dîsan çengên bi xwîne gef û tirsandinan dixwazin siya reş bikêşin ser esmanê welatê me.

Gefa ji aliyê têjkedîktatorên zêdexwaz bo ser destkevtên gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê, gefa reşekuj û hûrdedîktatoran bo êrişkirina ser Rojavayê Kurdistanê ku amadekariya yekem Newroza ber bi azadiyê ve dike, gefên li ser pêvajoya hêviya azadiyê li Bakûr, xuya ye ku di wan rojan de bi wê mebestê xurt bûne ku rê nedin hêviya rojên xweştir li Kuridtanê bi hêz bibin.

Li Rojhilata Kurdistanê, di bin siya reşe Komara Îslamî de, zext û zora li ser gelê Kurd tu sînûran nas nake.

Ji kuştin û girtinan re bigre heya pêşîgirtin ji xwedî derketin ji edet û nirxên civakî û neteweyî, rêjîma Îranê bi her rengî dixwaze pêşiya vegeşîna rengên nasnameya serbixwe ya gelê Kurd bigre û bi wê riyê hebûna gelê Kurd û daxwaziyên neteweiye gel nedîtî bigre.

Di wê çarçoveyê de rêjîma Îranê eger ne bi fermî be jî, lê bi awayek cidî, bi tirsandin û gefan, an bi riya xulamok û çinikxwarên xwe ve dixwaze pêşiya hilkirina agir li şeva kulekşarşemiyê û pişt re jî li roja Newrozê bigre.

Lê Adara bi heybet, tu dizanî ku ev hewldan ne tiştek zêde ecêb û dûr ji çaverêniyê ne, ji ber ku dematu hatî, tu bi xwe re hêviyê tînî welatê Kurdan. Weke çawan dema ku ronî hat tarî direve.

Dema şayî hat şîn dikeve, dema xweşî hat reşî diçe û dema agirê Newrozê vegeşiya, wê rûyê bi gemare reşêşevê ku îro di sifetê Komara Îslamî de penc kêşandiye ser Rojhilata Kuridstanê wenda bibe. Tirsa Komara Îslamî ji şehyan û xweşiya Newrozê, tu şiroveyek din nîne xênjî tirsa reşêşevê ji Agir nebe.

Ev dîtin bingeha nêrînek kurdane ya Adardost ji bo Newroz û agirê kulekçarşemiyê ye. Lewma pir asaiye ku hemû Kurdistan di wan rojên amadekariya cejna Newrozê de bibe agirdana guriya agirê Newrozê.

Li hember wê rewşê jî diyare ku wê Pasdar û Besîciyên dev bi xwîne Komara Îslamî bikevne amadebûnek tewaw heya pêşiya şahiya xelkê bigrin. Lê ew zext û zor wê nekaribe pêşiya geşbûna agirê Newrozê ji bo bixêrhatin kirina Adarê bigre.

**Adar! Tu bi xêr hatî.**

# Gotinên Pêşînan

A: Çiya Mazî



**Ava xurt serevraz diçit:**

Ava xurt tu astengiya li pêşiya xwe nahêle, ji ber ku bi hêz e û herderê tije dike û dihere. Girseyên bi hêz û pir jî çi astengiyên ku derdikevin pêşberî wan, nikare bi wê girseyê.Lewre girse bi yek be û pir be çi derkeve pêş diheciqîne û dihere.

**Ava xwestî naçe serî :**

Wekî ava ku xwediyê wê hebe an hinekan xwestibe naçe serî . Tiştên ku hinekî bixwaze û mirov lê bi xwedî derkeve an yê hinekî din be û mirov lê xwedî derkeve nabe yê mirov.

**Ava zelal tê de xuya ye xem û xeyal**:

Tiştê zelal û paqij her tim xweş tê fêmkirin,bûyer û tişt zelal dibe mirov ji xeyalên xwe li gor wê yekê dirêsin. Ji xwe dema ku bêyer pêşiya wê ne diyar û xuyayî be kes nizane rast bifikire. Ji bo mirov rast bifikire û rast tevbigere divê mirov li benda zelalbûna wê bûyerê bisekine.

**Awig diyezi virazen qûlpûz nûn pa**:

Awk arye berd wî hama geren çemçekiwî :

**Ax û avahî nav û navdayî :**

Wekî ax bi avahîyan xweş dibe,nav bi navdayînê tê bihîstin.Dîsa wekî ku axa mirov, avahiyên mirov hebin mirov navdar dibe.

www.arsivakurd.org

# ŞARISTANA QESRA ŞÎRÎN

Şaristana Qesra Şîrîn yek ji Şaristanên parêzgeha Kirmaşana Kurdistana Rojhelatê ye. Navenda vê Şaristanê bajarê Qesra Şîrîn e ku li nêz sînorê welatê Îraqê cih girtiye.

Şaristana Qesra Şîrîn li bakûr û rojava tevî Îraqê û li başûr tevî parêzgeha Îlamê û li rojhilat tevî Şaristana Serpêl Zehav û Gîlan Xerbê hevsînor e.
Li gor serjimêriya sala 1385 a Rojî nifûsa Şaristanê 117.890 hezar kes bûye.

Ew herêm bi ser sê navçeyên Elwend, Nesir Abad, Fetih Abad, û du bajarên Qesra Şîrîn û Somarê de hatiye parvekirin. Bajarê Qesra Şîrîn li 166 kîlomêtriya rojavayê bajarê Kirmaşanê de cih girtiye. Şaristana Qesra Şîrîn seba hebûna darên xurmê û herwisa werzêriya bi bereket nav û dengek zaf li Îranê de heye.

س
Her wiha ev Şaristan li hêla êkonomî seba hebûna petrolê li herêmê de gelek hestiyare û dewleta Îranê her tim li herêmê de cihên leşkirî yên mezin ava kirine.

Kurdên herêmê her li demên gelek zû li vir dijîn û di nava wan Kurdan de Oldarên Şîe, Sunî, Cihû û Goran jî hene ku serbarê hemû astengî û hîleyên dewleta Îslamiya Îranê bi xweşî tevî hev jiyanê dikin û çi kêşe û pirsgirêkên Olî li cem wan nîne.

Li destpêka şerê Îran û Îraqê di sala 1359'a rojî de ,bajarê Qesira Şîrîn yekem bajêrê Kurdistan û Îranê bû ku kete ber êrîşa dewleta Îraqê û li encam de hat dagîr kirin.

Li gor çavkaniyên dîrokî sedema sereke a nav danîna wî bajarî bi Qesra Şîrîn, çêkirina qesrekê ji bo Şîrîn xêzana Fele a Xusro Perwîz Padşahê Îranê li vê herêmê ye. Bajarê Qesra Şîrîn her li demên gelek kevnar de bajarek dîrokî û xwedî girîngiyek taybetî bûye, ku çêkirina bajar ji bo serdemê Xusro Perwîz Şahê Sasanî ê Îranê vedigere.

Li destpêka şerê Îran û Îraqê di sala 1359'a rojî de ,bajarê Qesira Şîrîn yekem bajêrê Kurdistan û Îranê bû ku kete ber êrîşa dewleta Îraqê û li encam de hat dagîr kirin.

Li encam vî şerê malvêranker da tenê Kurdan zirara sereke dît û mixabin bi hezaran Kurd û bi xasmanî zarok û jinên Kurdan bi destê du dewletên dijî Kurd ên Îran û Îraqê hatin Şehîdkirin.



A:Mecîd Rajanî



## Li Cîhanê De Bi Tenê Li Îranê Mahwarê Qedexe Ye




**Ebdulriza Ezîzî serokê komisyona civakî a parlemana Komara Îslamiya Îranê, derheq êrîşa hêzên ewleyî bo ser avahiyên xelkê bona komkirina mahwareyan got; "Pir xirabe ku di sedsala 21'an de hikumeta Komara Îslamî biryara qedexe kirina mahwareyan daye û bi riftarên nebaş Diş û mahwareyên xelkê kom dikin".**

**Ezîzî herweha ragehand ku heya heyamek berî niya di seranserê cîhanê de bi tenê di du welatên Îran û Efxanistanê de bikaranîna mahwarê qedexe bû, lê niha welatê Efxanistanê ji bikaranîna vê azad kiriye û bi tenê welatê me biryara han birêve dibe.**

www.arsivakurd.org

# AGIRÎ



Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Tel: (+)9647503640792


## Kemana Taytanîk Yek Milyon Dolarî Tê Firotin



**Kemana ku di dema niqombûna gemiya Taytanîk de, dihat lêxistin, bi milyonek Dolarî wê bê firotin.**


Keştiya transatlantîk a bi navê Taytanîk di sala 1912'an de, li 550 km nêzîk "Newfoundland"ê noqmî avê bû. Di dema noqimbûnê de, li hola keştiyê de çend kemanjenan keman lêdixistin. Kemana ku ji aliyê kemanjen "Wallace Hartley" ve dihat lêxistin, ji aliyê "Henry Aldridge and Son" ve tê firotin.

Nirxa kemanê di pêşbaziya firotinê de, wê bi ye milyon dolarî bo firotinê wê dest pê bik.

Xwediyê kemanê "Wallace Hartley" jî wek rêwiyên din ên Taytanîkê, jiyana xwe ji dest da.


## Welatê Ku Herî Zêde Emeliyata Estetîkî Li Wir Tê Kirin Îran E

**Serokê Komeleya emeliyatên Pilastîk a Îranê Dr. Kelentar Hurmuzî diyar dike ku, li Îranê kesên ku emeliyata estetîk dibin, temenê wan di navbera 17 û 26 salî de ye.**



Bihayê emeliyateke estetîk jî di navbera 1600 û 3000 dolarî de ye, û jinên ciwan, zêdetir emeliyata estetîk a pozê dikin. Li Îranê gellek bijîşkên ku emeliyata estetîk dikin hene. Ji van ancax 125 bijîşka, ji wezareta tenduristiyê destûra emeliyata estetîkê sitandine.

# Zarokan Digot: Dayê Bêhna Sêvan Tê!!



**Komeleya qorbaniyan li Kerkûkê daxwaza vê yekê ji wezareta şehîdan kirin ku rêz ji balafirvanê şehîd ê Turkemen Ra'îd Aydîn bê girtin.**

Hemwelatiyek bajarê Kerkûkê wêneyên kincên şehîd Aydîn ê Kerkûkî belav dike, ku têde bi sedema birêvenebirina biryara bombebarana Helebçê, di sala 1988'an de, navbirî hate bidarvekirin.

Komelaya navbirî herweha daxwaza vê yekê dike ku hewce ye wezareta şehîdan malbata Ra'îd Aydîn peyda bike û rêz ji wan bê girtin û herweha daxwaza çêkirina peykerê şehîd Aydîn li bajarê Helebçeyê kirin.

www.arsivakurd.org